Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :723 05-Çile- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# ‘Astengkirina filmê ji bo azadiyê nîşaneya tirsa dewleta Tirk a ji sînema Kurdî ye’



Filmê ‘Ji bo azadiyê’ ku wê roja 31’ê Kanûnê bihata nîşandan, lê Asayîşa Silêmaniyê destûr neda film were nîşandan. Hunermend Herdê Semîr têkildarî astengkirinê got; “Dewleta Tirk naxwaze wêrankariya ku wê li Bakurê Kurdistanê bi serê gelê Kurd de aniye were nîşandan. Ev yek jî nîşaneya tirsa dewleta Tirk a ji sînema Kurdî ye. Ev tirs jî ji bo Kurdan xala serkeftinê ye.”

Filmê ‘Ji Bo Azadiyê’ ku ji hêla derhêner Ersîn Çelîk ve hatiye kişandin û berxwedana Sûrê ya 100 rojan û bûyerên rasteqîn pêkhatine vedibêje, di hate payîn ku roja 31’ê Kanûnê li Sînemaya Salim a Silêmaniyê bihata nîşandan. Lê asayîşa Silêmaniyê bi behaneya ‘parastina berjewendiyên aramiya bajêr’ biryar daku ew ê rê nedin film were nîşandan.
Vê yekê bi xwere nerazîbûnek mezin derxist. Gelek hunermend, rewşenbîr û welatiyan li ser torên civakî nerazîbûn nîşanê vê helwesta asayîşa Silêmaniyê dan. Welatiyan diyarkirin ku astengkirina film parastina dijmine û li dijî nirx û çanda netewî ya gelê Kurd derketine. Li ser vê mijarê Hunermend Herdê Semîr ji Rojnews’ê re axivî.
Hunermend Herdê Semîr da zanîn ku heya niha jî sansorek zêde li ser sînema, wêje û rojnamevaniya Kurdî heye û wiha got; “Her mijarek ku ew nexwazin asteng dikin, piştre têkildarî sedemê astengkirinê jî ti tiştek nabêjin. Astengkirina film ji wan kesên ku di warê sînemayê de di xebitin re karek gelek girane. Ji berku çêkirina filmek dem, pere û zehmetiyek ya xwe ya zêde divê heya ku ew film dikeve ser şaşeyan.”
Têkildarî astengiyên asayîşa Silêmaniyê jî Herdê Semîr wiha axivî; “Dewleta Tirk naxwaze wêrankariya ku wê li Bakurê Kurdistanê bi serê gelê Kurd de aniye were nîşandan. Ev yek jî nîşaneya tirsa dewleta Tirk a ji sînema Kurdî ye. Dewletek wek Tirkiye ji sînemaya Kurdî bitirse, ev ji bo Kurdan xalek a serkeftinêye.”
Her wiha Herdê Semîr daxwaza yek helwestiyê ji sînemakarên Kurd kir ku wiha pêda çû; “Beşek zêde ji filmên Kurdî behsa bûyer û karesatên ku bi serê gelê Kurd de hatine dike. Ma ger filmên me ne li ser dîroka Kurda yan jî karesatên ku bi serê wan hatibin, gelo wê li ser çi bin? Em çi hilbijêrin? Pêwîste em dîroka xwe nas bikin. Divê em dîroka xwe bikin dîmen û têxin ser şaşeyên sînemaya. Ji berku niha dema wê yekê ye ku em haydarê dîroka her çar parçên Kurdistanê bin.”
***Rojnews***

# Di demekê nêzik de stasyona kehrebê ya Cibisa dikeve xizmetê

Desteya Enerjiyê bi lêçûna 60 milyon dolarî projeya kehrebê ya herêmên başûrê Hesekê di nava 2 rojên pêş de bi dawî dike.

Desteya Enerjiyê ya herêma Cizîrê projeya stasyona Cibisa ya rojhilatî navçeya Şedadê ya kantona Hesekê ku mezintirîn projeya kehrebê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dawî dike.
Lêçûna projeyê heta niha gihaştiye 60 milyonî, qeweta danê 30 MW e û li ser 3 devikan, her devikeke 10 MW destine belav dibe.
Serokê buroya veguhastin û dana enerjiyê ya herêma Cizîrê Mistefa Silêman diyar kir ku “Her 3 devik dê kehrebê ji stasyona Cibisa ya navçeya Şedadê bidin û ji wir jî dê bidin tora kehrebê ya sereke. Li vir 2 xetên sereke yên torê bi stasyona sereke ve girêdayî ne hene.”
Silêman soz da ku sala 2020`an dê hemû gundên navçeya Şedadê, stasyona kehrebê ya Mergeda ya başûrê Şedadê û bakurê pira başûr kehrebe hebe û were ronîkirin. Silêman got, “Komxebatên projeyê bi rê ve dibin ji sedî 99 kar bi dawîkirine.” û eger astengî dernekevin, di nava 2 rojên pêş de dê stasyona kehrebê were vêxistin.
Silêman bal kişand ku ev proje mezntirîn projeya ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê daye ava kirin e.



# Jîngehparêzan ji bo balîndeyan xurek danîn







Jîngehparêzên Başûrê Kurdistanê ên devera Balekayetî li çiyayên berf bariye ji bo balîndeyan di nav kevir û daran de xurek bi cih kirin.
Di van çend rojên bihurî de, li çiyayên Balekayetî gelek berf bariye, jiyana balîndeyan di nav metirsiyê de ye. Jîngehparêzên Balekayetî li çiyayên berf bariye ji bo balîndeyan di nav kevir û daran de xurek bi cih kirin.
komek jîngehdostên Balekayetî li hev kom bûn û ji bo balîndeyan hinek xwarin li çiyayê Balekayetî danîn û got, “Ji ber li çiyayan gelek berf bariye û xurekê balîndeyan di bin berfê de maye. Em welatiyên herêmê weke dostên jîngehê û ên xwe jîngehparêz dibînin. Me wek erka xwe zanî ku pêwîste em xwereka balindeyan ji wan re dînin.

# ‘BIKARANÎNA JINAN DI REKLAMAN DE KÊMKIRINA ASTA JINANE’

Di reklamên bazirganî û berhemên rengarenge bikaranîna jinan bûye sedema fikarên kesên azadîxwaz û wekhevxwaz. Welatiyên Silêmaniyê diyar kirin ku di reklaman de bi awayê mal û nîşandana jinan tenê ji bo bi destxistina qezencek zêdetir a bazirganî û kêmkirina asta jinane.***R-3***



Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 723 05-Çile- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## YE di mijara Lîbyayê de jî ‘bi fikar e’



Bi navê Berdevkiya Nûnera Bilind a Polîtîkaya Derve ya Yekîtiya Ewropayê daxuyaniyek hate weşandin û hate ragihandin ku ew “gelekî bi fikar in”. Di daxuyaniyê de hate gotin, “Yekîtiya Ewropa baweriya xwe timî dubare dike ku krîza li Lîbyayê bi rêbaza leşkerî çareser nabe.” ***R-2***

# Em ê bi vîna xwe hevbendiyan çêkin

Bakur û rojhilatî Sûriyê di qonaxeke hestiyar re derbas dibe, êrîş û metrsiyên guhertina koka demografiyê ji aliyê dagirkekeriya tirk ve gelek li pêş e. raydarên herêmê jib o rê li ber van kerasetan bigire bi riya diplomasî bi hemû hêz û welatan re ketiye nava dan û standinan. Hêza siyasî ya li herêmê ku buye vîna hemû gelên li Sûriyê êdî ketiye pêngavek nû ya tekoşînê. Rayadrên herêmê jî tekez li wê yekê dikin ku di demên pêş de bide ku hevbendiyên stratejîk bên çêkirin.



Hevseroka Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed li ser armanca wan ji hevdîtinên diplomasî li gel welatên din û ya herî dawî li gel komara Misrê, ji rojnama me re wiha axivî: Armanca me ji van hevdîtinan ew e ku, em êrîşên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku pêk tên, ji hemû cîhanê re pênase bikin. Herwiha li ser çareserkirina aloziya Sûriyê jî, nêrîn û pêşnûme pêşketin. Me ji wan re da xuyakirin ku, pêwîste nûnerên gelê Bakur û Rojhlatê Sûriyê beşdarî konfirans û civînên ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê tên li darxistin, bibin. ***R-4***



Endama Koordînasyona Kongreya Star Hediya Yûsif diyar kir ku ew hewl didin bi Şamê re bêyî ku Sûriye were parçekirin, bighêjin lihevkirinek stratejîk. Hediya Yûsif hişyarî da ku Tirkiyê herêmên dagir kirine tev li sînorê xwe yê siyasî bike. ***R-2***

## ‘Em bi hêvî ne sala 2020’an bibe sala dilgeşiya zarokan’




» Bi boneya hatina sala 2020’an mamosteyên di Keskesora Alan de wane didin zarokan rewşa zarokan nirxandin û gotin: “Em bi hêvî ne ku gelê herêmê bi me re bibin alîkar ji bo ku em bi hevdu re jiyaneke azad û aram ji zarokan re biafirînin.” ***R-6***

## huner jî rengekî parastinê ye



» Rûmîne Sîdo bi temenekî ciwan hem fêrî kemanê dibe, hem jî hevalên xwe fêr dike. Rûmînê têkildarî fêrbûna lêdana kemanê wiha dibêje: “Min dengê kemanê bihîst û gelekî bala min kişand. Di wê kêliyê de min biryar da ku ez fêrî kemanê bibim. Em bi hunera xwe li dijî dagirkeran disekinin.” ***R-7***

## Tirkiye hewl dide dagirkeriyê berfireh bike



» Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Demokratîk a herêma Cizîrê Telat Yunis bal kişand ser kiyarên dewleta Tirk ên guhartina demografiya herêmê û got: “Tirkiye hewl dide dagirkeriyê berfireh bike.” ***R-4***

## Kuştina Suleymanî û destwerdana Tirkiyê li Lîbyayê... herêmê ber bi şer ve dibe



Li herêma Rojhilata Navîn nîşaneyên şerekî mezin diyar dibin, ew îhtîmal piştî kuştina Qasim Suleymanî û biryara Tirkiyê ya ji bo şandina hêzan ji Lîbyayê re xurttir dibe. ***R-5***

## Dumaya Rûsya şandina hêzên Tirkiyê ji bo Lîbyayê red kir



Meclisa Duma ya Rûsyayê şandina hêzên Tirkiyê ji bo Lîbyayê red kir. Cîgirê Serokê Komîteya Duma ya Karûbarên Derve Dmitry Novikov ragihand ku Tirkiyê bi şandina hêzên xwe ji Lîbyayê re wê rewşê aloztir bike û dê bi awayekî neyînî bandor li gelê Lîbyayê bike. ***R-5***

# Dibe ku em lihevkirin û hevbendiyan çêbikin

Endama Koordînasyona Kongreya Star Hediya Yûsif diyar kir ku ew hewl didin bi Şamê re bêyî ku Sûriye were parçekirin, bighêjin lihevkirinek stratejîk. Hediya Yûsif hişyarî da ku Tirkiyê herêmên dagir kirine tev li sînorê xwe yê siyasî bike.

Ji destpêka aloziya Sûriyê ve rêveberiya siyasî ya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewl dide bi rejîma Sûriyê re bighêje lihevkirinekê ku yekitiya welat biparêze.

Rexmî ku ev lihevkirin berdewam in lê heta niha ti encam negirtine. Li gor rayedarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rejîm hîna di siyasetên xwe yên de berdewam e lew re niha ti encam ji diyalogan derneketine.



**‘ARMANCA RÊVEBERIYA HERÊMÊ NE PARÇEKIRINA SÛRIYÊ YE‘**

Di civîna salane ya Meclisa Rêveber a Kantona Şehbayê de endama Koordînasyona Kongreya Star Hediya Yûsif got: “Rêveberiya Xweseriya Demokratîk dijminahiya rejîma Baas nake, ji ber ku armanca rêveberiya li herêmê ne parçekirina xaka Sûriyê ye, berevajî wê armanca rêveberiyê yekitiya xaka Sûriyê ye, ev yek di rizgarkirina gelek deverên Sûriyê de diyar bû.”

Hediya Yûsif bang li rejîma Sûriyê kir ku “Pêşketinên demokratîk pêk bînin û sîstema gelên herêmê binase” her wiha Hediya anî ziman ku heger rêveberî dijminatiya rejîma Baas kiriba wê hikûmeta Şamê ji beriya salan ve hilweşiya ba.

**‘TÊKILIYÊN RÊVEBERIYA XWESER BI WELATÊN EREBAN RE PÊŞKETIYE‘**

Endama Koordînasyona Kongreya Star bal kişand ser dagirkeriya dewleta Tirk a li Sûriyê û destwerdana wê di karûbarên welatên erebî de wiha axivî: “Planên Tirkiyê kenalên doplmasî di navbera Rêveberiya Xweser û hin welatên erebî de vekir ên ku ji xeteriya planên Tirkiyê di herêmê de têghiştîn e. Siyaseta Tirkiyê ya nû ber bi Lîbya û hin dewletên erebî bi taybet piştî êrişîn wê yên li dijî Lîbayayê têkêkiyên rêveberiyê bi dewletên erebî zêde kir. Di nav de Misrê ku heta niha têkilî pê re didomin.”

Hediya di nava axaftina xwe de îşaret bi girîngiya beşdarkirina Rêveberiya Xweser di Komîteya Destûrî de “Divê em beşdarî komîteyê werin kirin, derbarê vê mijarê de nîqaşên erênî hene. Dîsa divê cihê Rêveberiya Xweser di qadên navdeweletî de hebe, di nava civînên Cinêvê.”

Hediya Yûsf anî ziman ku serkeftina tecrubeya demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê girêdayî yekitiya kurdî, yekitiya Ereb û Kurdan.

**‘HEWLDAN HENE KU QSD BEŞDARÎ ŞER LI IDLIBÊ BIBE‘**

Endama Koordînasyona Kongreya Star di nava gotinên xwe de îşaret bi mijara Idlibê kir û got: “Bangewazên beşdarkirina QSD‘ê ji bo vî şerî hene. QSD‘ê jî ji bo beşdarbûna şerê li Idlibê şertên wê hene, jê QSD‘ê wekî sazûmaniyekê di nava artêşa Sûriyê de were naskirin û qebûlkirin ji aliyekî ve û ji aliyekî din rizgarkirina Efrînê. Li gorî min şerê li Idlibê berdewam e ji ber ku rewşa li wir pir aloz e.” Hediya Yûsif bal kişand ku di navbera çeteyên li Idlibê de nakok hene. Hediya got: “Dibêjin Tirkiye sînorê xwe li pêşiya koçberên ji Idlibê venake. Lê aliyên ku şerê wan kirine û ew ji malên wan koçber kirinn û malên wan talan kirine. Sînga xwe ji bo koçberên Idlibê vekir.” Bi vê yekê îşaret bi daxuyaniya fermandarê QSD‘ê Mezlûm Ebdî kir, ku gotibû deriyê Bakur û Rojhilatê Sûriyê li pêşiya koçberên Idlibê vekiriye.

**‘TIRKKIRINA HERÊMÊN DAIGIRKIRÎ‘**

Hediya Yûsif girîngiya rizgarkirina tevahî herêmên ku Tirkiyê dagirkirine destnîşan kir û got: “Divê projeya Tirkiyê ya berfirehbûnê were astengkirin.” Hediya Yûsif hişyariya planên Tirkiyê yên dagirkirinê di Sûriyê de da û got: “Tirkiyê dixebite ku bi rêya guhertina demografî, guhertin çand, ziman û dane nasnameyên Tirkî hebûna xwe ji herêmên ku dagirkirine biparêze û amadekariyan dike ku van herêman tev li Tirkiyê bike û ji bo gundewarên Helebê jî planan dike.”Endama Koordînasyona Kongreya Star Hediya Yûsif der barê siberoja herêmê ev tişt anî ziman: “Dikarim bêjim ku şerê heyî gihiştiye xelekeke girêk, sala nû wê diyar bike, dibe ku em ber bi lihevkirin û hevbendiyên nû ve biçin. Hêvî dikim ku sala nû sala aştî, aramî, yekitî û azadiya gelê Sûriyê be.”

## Divê sûcên dagirkeran werin belgekirin

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê siyasetên xwe ji bo guhertina demografiya herêmên dagir dikin didomînin. Bi taybet li Efrînê û herêmên din li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Şêniyên resen bi cuda rêbazan didin koçberkirin û li şûna wan kesên ne ji herêmê bicih dikin.

Rewşenbîr û rûspiyên êlên Efrînê behsa metirsiyên siyasetên guhertina demografiya herêmê kirin û banga belgekirina binpêkirina kirin jib o ku ji raya giştî re werin pêşkêşkirin.



Endamê Yekitiya Rewşenbîrên kantona Efrînê Heysem Mistefa destnîşan kir ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê cureyên cuda yên çewisandinê pêk tînin bi armanca ku şêniyên resen ji warên wan derxînin û wiha domand: “Tevahiya cureyên cuda yên binpêkirinên der exlaqî pêk anîn ji topbaran, kuştin, revadin, îşkencekirin û wêrankirin bi armanca ku şêniyên resen ên herêmê bidin koçberkirin û demografiya herêmê biguherin.”

Mistefa bang li tevahiya şêniyan kir ku binpêkirinên dagirkeran li dijî wan belge bikin ji bo ku maf û axa xwe biparêzin. Mistefa got: “Rola rewşenbîran di vî warî de gelek girîng e. Em di Yekitiya Rewşenbîran de wê hewl bidin binpêkirinan û hewldanên demografîk belge bikin. Bi rêya amadekirina belgefîlman, derxistina pirtûkan, nivîsandina çîrokên şêniyan û azarên wan da ku bibin delîlek û çekek ji bo ku li qadên navneteweyî dewa mafên xwe bikin.”

Şêwirmendê siyasî û qanûnî ya Partiya Hevalbendiya Neteweyî ya Demokratîk parêzer Elaadîn El-Xalid Bahsa timayên dewleta Tirk a dagirker li herêmê kir û got: “Şoreşa Sûriyê ne xema dewleta Tirk e. Lê belê plan û timayên wê yên Osmanî girêdayî Mîsaqa Millî hene. Ji ber wê hincetan diafrîne ji bo ku şêniyên herêmê koçber bike û hebûna kurdî tune bike.”

El-Xalid wiha domand: “Bûyerên li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî rûdane îsbata vê yekê ye. Gelên herêmên dagirkirî rastî qirkirinên nejadî, koçberkirina bi zorê û çewisandina madî û manewî tên. Ew siyaset li dijî gelê Kurd bi taybet û gelê Sûriyê bi giştî pêk tên. Qanûnên navneteweyî jî van sûcan ceza dike.”

El-Xalid girêdayî girîngiya daxuyaniyên desteyên navneteweyî got: “Ya ku ji bo gelê Kurd girîng e ew e ku desteyên navneteweyî, herêmî, qanûna navneteweyî û rêxistinên mafên microvan ên cihanî van sûcên şer ên li dijî mirovahiyê û qirkirina nejadî rawestînin.”

Her wiha rûspiyê êla Amkî ya navçeya Reco ya kantona Efrînê Silêman Bekir hewldanên guhertina demografiya Efrînê û bicihkirina şêniyên ji derveyî herêmê li şûna şêniyên resen şermezar kir. û wiha axivî: “Paşguhkirina naveteweyî bi taybet ya Rûsya şermezar dikin. Ji ber ku li nêzî bargeha wê li bajarê Til Rifatê komkujî pêk hat. Lê dîsa jî li hember binpêkirinên ku qirkirina gelê Kurd armanc dikin bêdeng ma.”

## YE di mijara Lîbyayê de jî ‘bi fikar e’

Yekîtiya Ewropayê piştî ku dewleta Tirk tezkereya Lîbyayê ragihand, diyar kir ku ew ‘bi fikar in’. Bi navê Berdevkiya Nûnera Bilind a Polîtîkaya Derve ya Yekîtiya Ewropayê daxuyaniyek hate weşandin û hate ragihandin ku ew “gelekî bi fikar in”.

Di daxuyaniyê de hate gotin, “Yekîtiya Ewropa baweriya xwe timî dubare dike ku krîza li Lîbyayê bi rêbaza leşkerî çareser nabe.”

Berdevkiyê ragihand, “Destekên ji bo aktorên vî şerî wê aloziya li welêt û herêmê girantir bike.” Her wiha bang hate kirin ku bi rengekî bê kêmasî ambargoya çekan a Neteweyên Yekbûyî bi cih bê anîn.

Parlamenta Tirk roja Pêncşemê tezkereya ku derfetê dide şandina leşkeran ji bo Lîbyayê qebûl kiribû.



Rejîma Tirk bi rengekî eşkere piştgiriya hikumeta li navenda Trablûsê dike ku bi giranî ji endamên Biratiya Misilman pêk tê. Tevî wesayitên zirxî, çek û balafirên şer ên bêmirov her wiha di hefteyên dawî de bi sedan çete jî şand herêmê.

Serokê DYE’yê Donald Trûmp roja Pêncşemê bi hempîşeyê xwe yê Tirk Recep Tayyîp Erdogan re bi telefonê axivî û di mijara Lîbyayê de ew hişyar kir. Trûmp diyar kir ku destwerdana derve wê rewşa li Lîbyayê bêhtir tevlîhev bike.

Îsraîl, Qibris, Yewnanistan û Misrê jî nerazîbûn nîşan dan ku destwerdana dewleta Tirk a li Lîbyayê gefê li aramiya herêmî dixwe.



# huner jî rengekî parastinê ye

Rûmîne Sîdo bi temenekî ciwan hem fêrî kemanê dibe, hem jî hevalên xwe fêr dike. Rûmînê têkildarî fêrbûna lêdana kemanê wiha dibêje: “Min dengê kemanê bihîst û gelekî bala min kişand. Di wê kêliyê de min biryar da ku ez fêrî kemanê bibim. Em bi hunera xwe li dijî dagirkeran disekinin.”

*Fîdan Ebdullah / ŞEHBA*

Rûmîne Sîdo ji gundê Çolaqa ya girêdayî Cindirêsê ya Efrînê ye. Rûmîne Di temenê biçûk de dest bi fêrbûna amûra kemanê dike. Rûmîne him perwerdeya kemanê dibîne him jî hevalên xwe fêrî kemanê dike. Rûmîne niha li Şehbayê bi cih bûye û weke mamoste li navenda Tevgera Kevana Zêrîn, cihê xwe digire.



***‘Dengê kemanê ê xemgîn bala min kişand’***

Rûmîne meraqa xwe ji fêrbûna kemanê re wiha bi lêv kir: “Di destpêkê de min li navenda çand û hunerê ya Efrînê cihê xwe di komên govend û stranan de digirt. Min pir dixwest di aliyê hunerê de xwe pêş bixim. Min di destpêkê de dixwest xwe di aliyê sazê de pêş bixim, paşê min dengê kemanê bihîst û gelek bala min kişand. Di wê kêliyê de min biryar girt da ku ez fêrî kemanê bibim.”

***‘meraqa min êrîşên dijmin bibinxistin***

Rûmîne diyar kir ku êrîşên li ser Efrînê li hember meraqa wê nebû asteng û wiha domand: “Êrişên dewleta tirk li ser Efrînê, li hember meraqa min nebû asteng. Di nava êrîşan de me perwerdeya xwe yê hunerî domand. Dema Efrîn hat dagirkirin min xencî kemanê tiştek bi xwe re neanî. Li Şehbayê ji bo em ji hunera xwe qut nebin, me koma bi navê şehîd Hêvî ava kir û perwerdeyên xwe me li malan didît. Paşê navenda çand û hunerê ava bû, em derbasî navenda xwe bûn û me perwerdeya xwe domand.”

***Ez him fêr dibim û hem jî fêr dikim***

Rûmîne teqez kir ku ew him perwerdeya kemanê dibîne, him jî fêrî hevalên xwe dike û wiha pê de çû: “Li Efrînê hêjmara me pir bû, lê niha ez bi tenê mam. Min pêwistî dît ku ez hevalên xwe jî fêrî kemanê bikim, ji bo wê min komek bi navê Şehîd Rohînda û Şehîd Hêva ava kir. Tiştên ku ez fêr dibim, hevalên xwe jî fêr dikim. Dema şahî çêdibin em derdikevin ser dikê û hunera xwe pêşkêş dikin. Ji ber aloziya Sûriyeyê ez ji dibistanê qut bûm, lê niha li kêleka kemanê fêrî xwendinê jî dibim. Em bi hunera xwe li dijî dagirkeran disekinin”

## Rewşenbîr erk û berpirsiyarî

**Şama MIHEMED**



Di destpêkê de divê em binasin ku rewşenbîr kî ye? Rewşenbîr xwediyê hişmendiyeke vekirî û bi zanisteke resen, dagirtî ye. Kesekî jîr û zana ye.

Erkê wî/wê di civakê de ku nerîneke giştî dijberî zordarî û stemkariyê ava bike. Pişta civakê bigire û ramanên wê bi pêş bixe. Çavê miletê xwe be. Di tarîtiyê de mûm û fenera civakê be. Rêka wî ronî bike. Kelemên ku di rêya yekîtiya kurdan û avakirina civakeke demokratîk de derkevin, ji holê rake. Çareserkirina pirsgirêkên civakî, siyasî û abûrî hilgire ser milê xwe.

Bêdengî qet ne ji sinc û rewiştên rewşenbîran e. Rewşenbîrekî bêdeng, bi taybetî gava ku bûyer mezin bin û hemî civak têkildar be û mijar girêdayî raya giştî be, mîna tawanbarekî mezin tê dîtin. Bêdengiya rewşenbîr sûc e û gunehkarî ye ku zilmê û zorê bibîne û destnîşan neke. Rewşenbîr berpirsyar e, ku civaka jihevketî û nezan hişyar bike . Ramanên berxwedanê û serxwebûnê di nava civakê de belav bike. Hizirên çewt û xirab diyar bike. Ramanên îstratîjîk di nav de kûr bike. Pêwîst e rewşenbîr bi miletê xwe re be, di kêf û xemgînîyê de, Gerek e dilêşê netewê xwe be û navnîşana guhertin û hişyarbûna wî be.

Mixabin dagirkerên welatê me, xwestin me tune bikin. Ji ber vê yekê, her tim ziman û çanda me qedexe kirin. Ji ber ku zanîbûn, tunekirina neteweyekî tenê bi tunekirina ziman, çand û wêjeya wî gengaz e. Lewma rewşenbîr û zanayên welatparêz ên kurd, berî her tiştî bala gel kişandine ser parastina ziman û çanda kurdî û roleke girîng û bingehîn lîstine.

Rewşenbîr pîvana şaristanî û pêşdeçûna civakê ye. Berpirsiyarê hilgirtina nameya gel û welat e. Bi çeka xwe ya herî bihêz, bi pênûsa xwe parastvanê mafê netewê xwe ye.

## Fregmana belgefîlma Heskîfê ‘Sîya Avê’ hat weşandin




Belgefîlma Heskîfê û Gundê Ewtê yê Êlihê ku piştî bendava Ilısû di bin avê de ma û çîroka 2 jinan tîne ziman hat weşandin

Bi bendava Ilısu re gelek gund, navçe û warên jiyanê yên li bajarên Şirnex, Mêrdîn, Sêrt û Êlihê di bin avê de dimînin. Dîsa warê dîrokî yê 12 hezar salan Heskîf jî di bin avê de dimîne. Li gorî lêkolînan bi giştî 199 şûnwar dê di bin avê de bimînin. Piştî di meha tebaxê de çavên bendavê hatin girtin û heta niha herî kêm 35 gund di bin avê de man. Yek ji şûnwarên di bin avê de dimîne jî Gundê Ewtê yê Misirca Sêrtê ye. Belgefîlma Siya Avê ku çîroka gundê Ewtê tîne ziman hat kişandin. Piştî nûçegîhanê Ajansa Mezopotamyayê Metin Yoksu belgefîlm xelas kir, fragmana belgefîlma siya avê weşand.

Belgefîlm çîroka 2 jinên li Gundê Ewtê ji dayik bûne tîne ziman. Jinên ku gundê wan di bin avê de dimîne, beriya ku gund di bin avê de bimîne cara dawî diçin gundê xwe ziyaret dikin û ji bo bîranîna gundê xwe yê hemû jiyana wan li wir derbas bû lorikan dilorînin.

## Kampa folklorê diyarî Mazdek Ararat hate kirin

TEV-ÇAND her sal Kampa Govendê li dar dixe. Îsal jî di navbera 21-29’ê Kanûna 2019’an de li Elmanyaya Başûr kamp hate lidarxistin. Di kampê de govendên Semsûr, Qoçgirî, Botan û Amedê hatin gerandin. Di kampê de dersên rîtim, cil û bergên neteweyî jî hate dayîn. Govendgerên mezûn bûn jî dersên govenda Bedlîs, Xinis û Wêranşarê dîtin. Her roj li ser dîroka Kurdistanê, dîroka jinan, şerê taybet, heqîqet û azadiyê de jî semîner hatin dayîn.

Di dersa dawîn de rewşa dawîn a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hate nîqaşkirin.

**ÇALAKIYA BIBÎRANÎNA MAZDEK ARARAT**

Ciwanan hunermend Mazdek Ararat (Omer Bagci) jî bi bîr anîn ê ku di 13’ê Îlona 2019’an de li Rojava di qezayeke trafîkê de rehmet kiribû. Di vê çalakiyê de qala jiyan, têkoşîn û hunermendiya Ararat hate kirin.

**KONGRE Û ŞEVA MORAL**

Di roja dawîn a kampê de serdema 2019’an hate nirxandin û plansazî hatin kirin.

Çalakiya moral jî êvarî hate kirin. Polên sêyemîn û çaremîn skêceke 30 deqîqeyî amade kirin. Piştre ciwanan stran strandin û govend gerandin.



Di dawiya şevê de sertîfîkayên ciwanan hate dayin.

Piştî axaftinan şeva moralê bi dawî bû.

Kampa Govendê li Elmanyaya Başûr bi tevlêbûna 70 govengeran pêk hat. Kamp diyarî hunermend û milîtanê azadiyê Mazdek Ararat hate kirin.



## Polîtîkayên Rûsya Li Ser Kurdan 3

**Sîpan ŞÎNDA**

Sovyet Rûsya di Şerê Cîhanê yê Duyem de (1939-1945), her çend wana weke dewletên emperyalîst ji dibîne, lê ew di nava refên Dewletên Hevkar de ciyê xwe digire. Di taliya şerî de jî ew di bloka dewletên serketî de ye. Lê belê piştî vê pêvajoyê jî di stratejiya Rûsya ya di derbarê polîtîkayên Kurdan de çi guhertin çênabe. Di warê stratejî pêşxistinê de Sovyet Rûsya, bi taybetî jî di warê aborî û siyasî de li himberî Emerîka-Brîtanya lehwaz dimîne. Him di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de û him jî piştî şerî, di warê teqtîkî de, Rûsya nêzîkbûneke heckû piştgiriya Kurdan dike (weke li Rojava) nîşan dide. Lê ev nêzîkbûna Rûsya tenê di warê teqtîkî de ye û ne stratejîk e. Di damezirandina Komara Mahabadê de, di serî de hinik nîşanên piştgiriyê yên polîtîk-leşkerî dide. Jiberiya Komara Mahabad bête avakirin, têtezanîn ku rûspiyên Kurdan çend caran diçin serdana Rûsya yê û bi wan re hevdîtinan dikin û piştgiriya polîtîk û alîkariya leşkerî ji wan dixwazin. Lê diyare ku Sovyet Rûsya ji roja ewil de germ nafeke Kurdistaneke serbixwe. Ji ber wê ye ku şûna ew bi xwe bi Kurdan re hevdîtinan bikin, pitirê xwe rayedarên Ezerbeycanê bi Kurdan re dikin mûxeteb. Ev jî nîşana wê ye ku polîtîkayên Rûsya yên di derbarê Kurdan de bi awayekî erênî nehatiye guhertin. Lê Kurd dîsa di wê demê de jî bêçarene û divê ji xwe re piştgiriya polîtîk û alîkariya leşkerî peyda bikin. Çi belgeyên wê demê yên di derbarê naveroka hevdîtinên rûspiyên Kurdan û rayedarên Sovyet Rûsya de di destê me de nînin. Di navbera wan de tam çi hatiye axaftin em nizanin. Lê mijar her li ser Kurdistaneke serbixwe û pêşeroja Kurdan û piştgiriya Rûsya ye. Lê belê di hinek belgeyan de dibêje ku niyeta Sovyet Rûsya ew e ku Kurdan girêdayî Ezerbeycanê bikin. Rayedarên Rûsya wê demê ji Kurdan re dibêjin ku ji bû Kurdistaneke serbixwe hêj zû ye û ya baş ew e ku Kurdistan di nava tixûbê Ezerbeycanê de bimîne. Vê jî bi riya serokwezîrê demê yê Ezerbeycanê ji Kurdan re radigihîne. Lê belê Kurd jî vê napejirînin û di sala 1946’ê de Komara Mahabadê ava dikin. Tê gotin ku Rûsya alîkariya hinek çek daye Kurdan. Lê belê çekên Kurdan bi piranî yên ji leşkerên Îrana di Şerê Cîhanê yê Duyem de binketî mane erdê ne. Aloziya petrolê ya piştî Şerê Cîhanê yê Duyem destpê kirî, dewletên mezin bênavber têxe di nava lêgerîna dîtina xarên petrolê yên nû de. Emerîka û Brîtanya dikevin di nava hewldanên destxistina xarên petrolê yên Îranê de. Sovyet Rûsya jî bi heman mejiyê mêtîngerî dikeve di nava hewldana destxweve anîna petrola Îranê. Ji ber vê jî Sovyet Rûsya him ji bo bandora xwe li ser Îranê çêbike û him ji bo destxweve anîna xarên petrola Îranê, têkiliyên xwe yên diplomatik bi Îranê re ji nû ve zindî dike. Piştî hevdîtina rejîma Îranê û Sovyet Rûsya, di 9’ê Gulana 1946’ê de Radyoya Moskowa bi awayekî fermî bangdihildêre û dibêje Sovyet Rûsya çi piştgiriya Komara Kurdistanê nake.

# ‘Em bi hêvî ne sala 2020’an bibe sala dilgeşiya zarokan’

Bi boneya hatina sala 2020’an mamosteyên di Keskesora Alan de wane didin zarokan rewşa zarokan nirxandin û gotin: “Em bi hêvî ne ku gelê herêmê bi me re bibin alîkar ji bo ku em bi hevdu re jiyaneke azad û aram ji zarokan re biafirînin.”

**Dîcle Demhat/ KOBANÊ**

Piştî şerê DAIŞ’ê yê li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyeyê gelek zarok di encama şer de sêwî man. Ji bo zarokên sewî Weqfa Jina Azad a herêma Firatê baxçeyê zarokan a bi navê Keskesora Alan li Kobanê vekir. Pêwistiyên zarokan di hemû aliyê jiyanê de pêk tînin. Bi êrişên dewleta tirk û hevkarên wê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re careke din jiyana zarokên sêwî ket bin xeteriyê û di encama êrîşên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyeyê de bi dehan zarok bê dê û bav man. Êrîşên li ser herêmê bandoreke neyînî li ser derûniya zarokan çêdike. Mamosteyên di Keskesora Alan de wane didin zarokan di nava hewildanan de ne ku derûniya zarokan dûrî rewşa heyî bixin û weke zarokên cîhanê bi aramî jiyana xwe berdewam bikin.

Di vê çarçoveyê de mamosteyên di Keskesora Alan de dixebitin ji ajansa me re axivîn.

***‘Piştî şerê DAIŞ’ê carek din jiyana zarokan ket xeteriyê’***

Mamosteya derûnîyê ya Keskesora Alan Hêvîn Reşîd, rewşa zarokan nirxand û got: “Piştî şerê çeteyên DAIŞ’ê û êrîşên herî dawî yên dewleta tirk û hevkarên wê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyeyê li ser derûniya zarokan bandoreke neyînî çêkir. Ji bo ku em zarokên sêwî wek zarokên din tevlî jiyanê bikin me gelek xebat dan meşandin. Heta astekê derûniya zarokan baş bû û jiyana xwe wek her zarokekê jiya. Pîştî êrîşên dewleta tirk û hevkarên wê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyeyê, zarok careke din derûniya şer dijîn. Her çiqas em hewil didin derûniya zarokan dûrî rewşa şer bixin dîsa jî di fikirê wan de rewşa şer û di navbera wan de nîqaş li ser şer tên kirin. Her wiha zarok di metirsiyê de ne ku ji hevdu qut bibin. Dema ku êrîş dest pê kirin me hewil da ku zarokan li cihekî bi ewle bicih bikin. Dema ku ji cihê xwe dûr ketin ji dibistan û hevalên xwe jî dûr ketin. Ev yek bandorek li ser wan kir. Niha jî ji bo bi tirs û tenêbûn nejîn em di nava hewildanan de ne.”

**Xebatên me wê zêdetir bibin**

Hêvînê bal kişand ser karê Keskesora Alan a 2019’an û pilansaziya ji bo 2020’an û wiha pê de çû: “Di 2019’an de me zarok di aliyê perwerde, jiyanî, derûnî û hunerên destan de pêş xistin. Me daxwaz û xwastekên her zarokekê pêk anîn. Bi giştî bernameya ku ji bo 2019’an hatibû amadekirin me






pêk anî, lê carinan ji ber kêmderfetan kêmasî derdiketin. Ji bo sala 2020’an jî me bername çêkir. Her zarok wê dibistana xwe berdewam bike û wê di qursên hunerên destan de cih bigirin. Dema ji dibistan û qursan dizivîrin bernameya ku di Keskesora Alan de pêk bînin jî hene. Mînak her zarokek di waneyên ku tê de zehmetîyê dikişînin em bi wan re dibin alîkar, saetên lîstokên wan, tv û xwendina pirtûkan hene. Di Sala 2020’an de em ê xebatên xwe zêdetir bikin û pêş bixin.”

***‘Jiyana zarokan ji bo me girîng e’***

Hêvînê diyar kir ku ew ji bo jiyaneke xweş ji zarokan re peyda bikin xebatê didin meşandin û wiha got: “Jiyana zarokên Keskesora Alan ji bo me girîng e. Em ji bo zarokan ked didin ji bo ku xwe kêm nebînin, lê dîsa jî kêmasî derdikevin. Em bi hêvî ne ku gelê me yên li vir û yên li dervayî welat di aliyê madî û manewî de bi me re bibin alîkar û em bi hevdu re jiyanek xweş ji bo zarokan peyda bikin.”

***Ji bo jiyaneke azad, têkoşîna me berdewame***

Mamoste Evîn Îbrahîm diyar kir ku daxwazên wan ew e ku êrîşên li ser heremên wan bisekine û wiha pê de çû: “Heta niha tu serlêdan ji bo Keskesoran Alan çenebûne, lê em lêkolin dikin û xebatan didin meşandin ji bo ku zarokên sêwî mane, bigirin û alîkariya wan bikin. Çawa em nêzî zarokên xwe dibin em wisa nêzî zarokên sêwî jî dibin. Ji bo zarok jiyaneke azad bijîn em ê ked bidin. Daxwaza me ew e ku êrîşên li ser heremên me bi dawî bibin, careke din zarokên welatê me sêwî nemînin û wek zarokên cîhanê zarokatiya xwe bijîn. Ji bo zarok jiyaneke azad û aram bijîn em ê têkoşîn û berxwedana xwe xurt bikin.”

## Şer bandora xwe li ser zarokan dike

**Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo**



Berpirsa Parastina Zarokan Suheyla Ibrahîm derbarê bandora şer li ser derûniya zarokan wiha ji rojnama me re axivî: Zarok ti carî dîmenên şer yê bi êş ji bîr nakin, eger mirov jî alîkariya wan neke, wê di demên pêş de ji wan re bibe nexweşî.

**ÇALAKIYÊN ŞAHIYAN KÊFÊ DIXE DILÊ ZAROKAN**


Berpirsa Parastina Zarokan Suheyla Ibrahîm li ser derûniya zarokan di rewşên şer de wiha axivî: Her dem em hewil didin bi çalakiyên cuda yên şahiyan, kêfê bixin dilê zarokên koçber. Zarokên ku ji ber êrîşan ji cih û ware xwe hatine dûrxistin, dîmenên koçberiyê di mejiyên wan de dimîne û zû bi zû wan dîmenan ji bîr nakin. Ev yek jî li ser derûniya wan pir xetere, eger malbat yan jî rêxistinên mirovan derbarê vê yekê de bi wan re nebin alîkar, di demên pêş de wê ji wan re bibe weke nexweşiyekê.

Derbarê vê mijarê de rojnama me hevdîtinek taybet, bi zarokên Serê Kaniyê re çêkir. Zekî Îbrahîm (18)ê ji bajarê Serê Kaniyê ku ji ber êrîşên dewleta Tirk neçar ma ji dibistana xwe dûr bikeve, hastên xwe yê koçberiyê wiha anî ziman: Ji ber tang û topên dewleta Tirk ez neçar mam ku ji heval û cihê lê mezin bûne dûr bikevim. Pêşroja min di xwendina min de ye, ev çend salên min ez dixînim ji bo bawernama xwe ya amadeyî bigirim dest, lê ev êrîşana bû sedema dûrketina min ji perwerdeyê. Ez dikim nakim dîmenên derketina me ji bajêr, ji bîr nakim.

Ez bêriya hevalên xwe dikim Zekî wiha axaftina xwe bi dawî kir: Piştî em ji bajarê xwe Serê Kaniyê derketin û li Qamişlo bi cih bûn, min xwest dîsa xwendina xwe berdewam bikim. Niha ez li peymangehê dixwînim. Ji roj êrîşan heta niha tiştekî li ser hevalên xwe nizanim, lê bi hêvîme ku ew jî ji xwendana xwe dûr nekevin. Raste êrîş bandorê li ser derûniya mirovan dike, lê ya herî dirist ew e ku, em li ber xwe bidin. Em di wê baweriyê dene ku wê rojek were emê vegerin bajarê xwe. Ez û hevalên xwe dîsa emê bi hevre biçin dibistanê û li kolanên bajêr bi hev re bigerin.

**MIN BÊRIYA HEVALÊN XWE KIRIYE**

Lewnd Mihemed jî yê 12 salî wiha axivî: Min pir bêriya mala xwe kiriye, û lîstika bi hevalên xwe re. Ji ber êrîşan min nikarî pêlîstokên xwe û alavên dibistanê bi xwe re bînim. Min bêriya hevalê xwe jî kiriya,raste hevalên min li Qamişlo jî çêbûne, lê yên ku min bi wan re li kolanên bajêr dilîst, di dilê min de manin. Ez pir dixwazim vegerim bajarê xwe, min bêriya wê derê kiriye.



### SALA NU û DÎROKA NU

**Medeni FERHO**

Saleke nû, civakeke nû, siyaseteke nû, dîrokeke nû, nasnameyeke nû heye. Îro!... Wek ereb dibêjin, em ê bi rêbaza “lûbbû’l-lûb”- cewhera cewher, çend gotinan bêjin. Referansên me zindî ne. em û referans bi hev re dijîn.

Em dîrokekê dijîn… Lûbbûl-lûb bi dîroka nû ya Kurdistanê re!... Ev vekirina parantêza beriya 40 salî ye, gelê Kurd jî, li hemberî hemû anaforên tunekirinê, dîroka xwe ava kir. Di destpêka vê parantêzê de bêguman lehengên Kurd hene. Gerilla!... Lûbbûl-lûb-cewhera cewherê dîroka nû, ne. Dîrok, ne tenê şer e, hiş e, raman e, buyer e, guhertin e, nûbûn e, fêrbûn e, guhertin e, rêxistinî ye, dîplomasî ye, kirin e, avakirin e, ziman e, kultur e, nasname ye, xwedî derketin e, di cîhana akademîk û siyaseta navneteweyî de erê kirin e! Ne ezber e, hewngîrî ye, hişmendî ye, rambîrî ye!...

Dîrokek tematîkî heye û di encama disîplîneke felsefîk û siyasî de derketiye holê. Pêşengî û xerca hiş û raman, rê û rêbaz ya Birêz Ocalan e, partîk ya Gerilla ye… Em vê mînakê, di serdemên Mediyan de, di hêzên “nemiran” de dibînin, îro, karwanê “Nemirên Kurdistanê” hene.

Lûbbûl-lûb dîroka îro, di serdemeke ku di nava demên ji hev qutequtî bela nebûye, yekpare ye, qonax hebin jî parçe nebûye û dewam dike. Arêna siyasî û têkoşîna berdewam mînak e!... Zindana Amedê, Geliyê Bekaa, Akademiya Mahsum Korkmaz, 14ê Tebaxê, Herêmên Parastina Medya, Gerilla, Ocalan, Komploya Navneteweyî, Imralî, Pêvejoya Çareseriyê, Mutabakata Dolmabahçe, Berxwedana Gel û Şoreşa Rojava… Ev kodên dîroka nû ne, bêguman, kodên nû, dikarin werin zêde kirin… Min riya kin, “sehl-î mumtenî” bijart.

Nêrîna li bûyerên rojane jî diker bibe riya kirin û fêhmkirinê!..

Cewhera cewherê dîroka nû jî, jiyana di nava van bûyeran de ye… Vegotina li ser dîroka nû, guhertin û cûdatiya ji salên dûr û dirêj ya dîroka Kurd, riya kin e. (sehl-î munten), lê kinbûna vê dîrokê, di mercên herî giran de belakirina ewrên reş e, berterefkirina siyasetên “kerberazî- inkar û tunekirinê” ne… Zimanê Kurdî, kire xizmeta mêjiyê Kurdî!...

Li cografyayek di inkarê de hatibe tunekirin, civakek di tarumarkirinê de hetibe pûç kirin, di dîrokek derew de hetibe felc kirin, di siyasetek qedexekirî de hatibê zincîr û lelekirin, di bedenek dagirkirî de hatibe lixab kirin, di ragihandinek manîpîlasyonî de hatibe kerûlalkirin, di kanunên qezetore de hatibe korkirin, di tora beko evan, reyber û qasiman de, di davik û kemînan de hatibe dîlgirtin… Di rewşek wiha de, wakanûvisîhaceganiya bûyerên serdemê ne hêsa ye!... Mixabin, di beşekî romana Kurdî de, fesadiya di hişmendiya Kurdî de heye, ji restorasyona “mêjî”paşverûtir e, şaşiya di navbera “atalet” û “têkoşînê”de “tezahur”a pax monopol’e!... Mixabin!....

Dîroka zihnî-hişmendî ya gelê Kurd, êdî “tazahurata” pax monopol qebûl nake. Anafora serdema me, Rojava ber bi statuyekê dibe, lê mixabin Başûr, ji satuya heyî ber bi tunekirinê dibe. Partiyên siyasî, êdî mecbur in, di paratîk û teoriyê de xwe biguherin, bi pêkanîna yekîtiya neteweyî û bi hêzkirina Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê KNKê, rê nedin ku Kurd, car din duçarî metfûnkirina gora betonî bibin. Biqasî rewşenbiriya Kurd, partiyên siyasî jî nikarin bi hişmendiya pax monopol haraket bikin.

Dîroka nû, bi gotinek rojane û mînak, Şoreşa Rojava ye û em nav lê bikin: Ji bo paşerojan peyamek ronî ye… Em dubare bi nav bikin; rizgarkirina mironiyê, ji mirovtiyê dûrketi ye… Têkoşîna li dijî çeteyên DAIŞê, rizgarkirina mirovaniyê, ji tarîtiya sedsalê, kurt û kurmancî ev e!...

Dîroka Kurdan ya nû, hem di lîteratura akademik de, hem di hiquqê cîhanê de (naturalist, micellekelam, roma, anglo sakson, û modern) de, tê erê kirin. Ev dîrok, bandore li rîtma hiş û ramanê mirovan û jiyana rojane dike û abad dibe.



# ‘Bikaranîna jinan di reklaman de kêmkirina asta jinane’

Di reklamên bazirganî û berhemên rengarenge bikaranîna jinan bûye sedema fikarên kesên azadîxwaz û wekhevxwaz. Welatiyên Silêmaniyê diyar kirin ku di reklaman de bi awayê mal û nîşandana jinan tenê ji bo bi destxistina qezencek zêdetir a bazirganî û kêmkirina asta jinane.

Di kanalên tevîzyonan de rojane bi dehan reklamên bazirganî tên nîşan dan. Herwiha kompanyayên reklaman jî ji bo qazancek zêdetir, piranî jinan di reklamên xwe de bi kar tînin. Bi vê rê ziyanek mezin didin jinan. Ev yek ji boye sedema nerazîbûna welatiyên azadîxwaz û wekhevxwaz ên Silêmaniyê. Welatiyên Silêmaniyê têkildarî di reklaman de bi karanîna wêneyên jinan ji Rojnews’ê re axivîn.

**Îman Xelîl:** Di nava hemû civakan de mijara di reklaman de jin heye. Civaka Kurd jî çav li welatên din dike. Zêdetir bazirgan jinan bi kar tînin. Ev jî bi armanca balkişandina welatiyane. Mixabin ew jinane cilûbergên hêja li ber xwe nakin. Rolek baş nabînin. Eger di reklaman de zêdetir jin di aşxaneyan de nîşan bidin, ev yek nîşan dide ku mêr jinan zêdetir ji bo karê nava malê bi kar tînin. Gelek tiştan weke çand û ol têkil kirîne. Jin bi xwe azade û ne bindestê ti kesêne.”

**Newzad Ehmed:** Ev reklamên bazirganî ku bi jinan çêdikin, ger di çarçoveya bazirganî de be, em bi tiştek nabînin. Li gorî ku dibînim, reklam ji bo kesekê ye, ne ji bo kelûpelane. Ev kêmkirina hebûna jinane.




**Asos Mehmûd:** Rewşa wiha ye lê hatiye, ger reklamê bi jinan nekin, mal kêm tê firotin. Her çiqas bi piştrastî bazirganiya bi laş û xwişbûna wê jinê ye, lê heta astekê jin bi xwe ji bo vî karî rê xweş dikin.




Asos Mehmûd hunermend ji rexne kirin û got ku nabe bi vî awayî beşdarî reklamên bazirganî bibin û got;”Her çiqas dibe ku berjewendiyê wan ji têde be û ji ber hezkirina wan a di nava xelkê de ew berhem zêdetir bên firotin. Ev reklamên ku jinan kêm bikin û di nava civakê de weke beşek lawaz bibîn, em hemû red bikin.”




## ‘Pêkanîna projeya netewa demokratîk dê dawî li aloziyê bîne’

Demek direj e li ser yekitiya kurd nirxandin tê kirin, Rêvebera Desteya Jin ya Herêma Efrînê Zelox Reşîd jî bal kişand ser pêwistiya li darxistina kongreya neteweyî û got: “Ji bo ku em bikarin cihê xwe di vê sedsalê de bigirin pêwiste em yekitiya xwe ava bikin.”

Kongreya Netewî ya Kurdistan (KNK) di 24’ê gulana sala 1999’an de li bajarê Amisterdam ya Holandayê hat avakirin. Li hember êrîş û binpêkirina mafê mirovan yekitiya netewî ji bo çareseriya aloziyan hat avakirin. Tekîldarê mijarê Rêveberiya Desteya Jin ya Herêma Efrînê Zelox Reşîd di derbarê girîngiya yekbûna gelan nêrîna xwe parvekir.

***‘Pêwiste gelê kurd yekitiya xwe ava bike’***

Zeloxê di despêka axaftina xwe de girîngiya yekitiya gelê kurd nirxand û wiha got: “Di despêkê sala 2020’an dê kongreyek nîştîmanî ya netewî li ser asta Kurdistanê bi pêşengiya Kongeya Netewî ya Kurdistanî were li dar xistin. Ji bo yekbûna Gelê Kurd, bi gelek partiyan re hevdîtin hatiye çêkirin û encam jî başe. Em ê destê xwe bikin yek û yekitiyek xurt avabikin, ji ber ku ev sedsala ji bo tevahî cîhanê û bi taybet ji bo gelê kurd girîng e. Ji bo ku em bikaribin cihê xwe divê sedsalê de bigirin pêwiste em yekitiya xwe ava bikin.”

***‘Xwedî derketina têkoşeran, misogerkirina yekitiya netewî ye’***

Zeloxê destnîşan kir ku divê ew xwediyê li têkoşerên azadiyê derkevin, ji ber ew têkoşer canê xwe ji bo yekitiya axa Kurdistanê feda kirin e û wiha domand: “Ji



despêkê dîroka gelê kurd heya roja îro, bê hêjmar can, ji bo axa Kurdistanê û gelê kurd hate dayîn, ji bo vê yekê divê em xwediyê li têkoşerên xwe derkevin ên ku canê xwe ji bo yekitiya axa Kurdistanê feda kirin e. Xwedî derketina têkoşeran, misogerkirina yekitiya netewî ye.”

***‘Pêkanîna projeya netewa demokratîk, dawî li aloziya ku tê jiyîn bîne’***

Zelox behsa çareserkirina aloziya Sûriyeyê kir û wiha pêde çû: “Aloziya ku di Sûriyeyê diqewime divê bi rêya yekbûna netewî ya kurdî bê çareserkirin. Bi avakirina şandeyek ji hemû partiyên siyasî ku karibin mafê gelan biparêzin, bi tevlîbûna wan ji civînên ku li ser asta cîhanî tên li dar xistin, bi pêkanîna projeya netewa demokratîk wê dawî li alozê ku tê jiyîn bînin. Jina kurd roleke sereke di Şoreşa Rojava de lîst, ji ber girîngiya hebûna jin di Şoreşa Rojava de divê cihê xwe di nav yekitiya netewî de bigire û li ser esasê vê fikirê kar û xebatê xwe bide meşandin.”

***‘Sala nû wê bibe, sala yekitî û serkeftinê’***

Zelox herî dawî hêviyên xwe wiha parvekir: “Em hêvîdarin ku Kongreya Netewî ya Kurdistanî were li dar xistin û bi encamên serkeftî derkeve. Sala nû wê bibe sala yekitî û serkeftinê. Xewn û xeyalên me yê kurdan wê bi rêya kogreya netewî pêk were.”***Jinews***

## Jinên Tebqayê xebatên xwe nirxandin

Rêveberiya Sivîl a Herêma Tebqayê civîna salane ya taybet bi rewşa jinê lidar xist. Di civînê de ji piştevaniya bi jinê re plansazî hate danîn.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Cîhan Xidro, hevseroka Meclisa Qanûnsaz a Tebqayê Rewşen Hemê, hevseroka Meclisa Rêveber a Tebqayê Hind El-Elî û bi dehan jin ên di nava saziyên sivîl û leşkerî yên Tebqayê de amade bûn.

Piştî deqeya rêzgirtin a bîranîna şehîdan seroka Desteya Jinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Cîhan Xidro rewşa siyasî nirxand.

Rêveberiya Komîteya Jin a Rêveberiya Sivîl a Tebqayê Wela El-Nacîn rapora salane ya



Meclisa Rêveber a Jinê xwendin. Rapora salane ya Meclisa Qanûnsaz a taybet bi jinê ji aliyê Rewşen Hemê ve hate xwendin. Beşdaran rewşa siyasî, rewşa jin di nava saziyan de nirxandin û ji bo pêşxistina kar û xebatên jinan pêşniyarên xwe anîn ziman. Piştre plansaziya dema bê hate danîn, ji wan; zêdekirina serdana malbatan bi rêya komîteyên pispor da ku li ser rewşa wan a civîn û ya jinê bisekine, zêdekirina çalakiyên jinan û vekirina projeyên aborî ji bo jinên bî û yên ji hevjînên xwe cûda bûne.

Der barê xebatên jinan di Rêveberiya Sivîl a Tebqayê de yê sala 2019‘an de belgefîlmeke the pêşandan.

Civîn bi nîqaşan li ser astengiyan ku jinan di sala borî de kişandin û çareserkirinê bi dawî bû.

## Hejmara nû ya Newaya Jin derket

Hejmara 178’an a Newaya Jin ku bi formateke taybet hate amadekirin, giraniyê dide ser Komkujiya Parîsê ku di 9’ê Çileya 2013’an de hate kirin. Tevî armanc û encamên komkujiyê, her wiha her sê jin ên şoreşger ên hatin qetilkirin, hatin vegotin.

Elîf Mercan bal kişand ser jinên ku di dema kevn û ya nêz de ji aliyê sîstema kapîtalîst ve hatin qetilkirin û destnîşan kir ku vê yekê bi tevgerên jinê re paşve gav neda avêtin û got, “Ew bûn wêrekiya me ku em dest bi têkoşîneke nû bikin.”

**ZANEBÛN, BAWERÎ Û WÊREKÎ**

Besîme Gonca qala şahidiya xwe ya ji berxwedana rêveberiya xweser re kir û di şexsê Sêvê Demîr, Fatma Ûyar, Pakîze Nayir, Bejîn, Ferîde û Asya Yukselan de pêşengiya jinê bi bîr xist. Gonca destnîşan kir, ya ku di 4’ê Çileya 2016’an de bi Komkujiya Silopiyayê re xwestin qetil bikin, wêrekiya serînetewandinê ya jinên Kurd, hişmendiya xwe ya azadiyê û bawerî û biryardariya azadiyê bû. Aktîvîsta TJA’yê Gulcîhan Şîmşek jî heman mijar di rûpela Kurdî de şîrove kir û bal kişand ser karakterê têkoşîna her sê jin ên şoreşger temsîla wan dikin.

**SARA BÛ ŞOREŞ**

Denîz Bîlgîn ji bo yek ji damezrînerên PKK’ê Sakîne Cansiz destnîşan kir, ku bi têkoşîn û jiyana xwe veguherî şoreşê û got, “Hêza mirovan a ku xwe kir şoreş ji desthilatdar û hêrsan hemûyan xurt e. Têk naçe.”

Sema Mazlûm jî Cansiz weke ‘Manîfestoyekê’ pênase kir û jiyana wê ya têkoşînê vegot.

Rojnameyê her wiha xwe gihand şagirtên Sakîne Cansiz ên li Kampa Mexmûrê û nêrînên wan der barê Cansiz de wergirt.

Ji qunciknivîsên rojnameyê Zerya Gul û Gulistan Îke jî giranî dan ser kesayetên li dijî polîtîkayên qirkirina jinê pêşengiyê ji têkoşîna jinê re dikin.




Zîlan Diyar qala Fîdan Dogan kir û bi gotina “Şoreşgerek bû ku di têkoşînê de bi tevahiya kesayetiya xwe fedakarî kir” ew pênase kir.

Dîlan Amed jî taybetmendiyên bingehîn ên Leyla Şaylemez, lêgerînên wê û dînamîzma wê ya têkoşînê vegot.

Eylem Ronî jî çalakiyên jinan ên bi dansê bûn sembolek nirxand û bi bîr xist ku vê berxwedanê tarîtî ji holê rakir û kolan xiste nava liv û tevgerê.

Di hejmara nû ya rojnameyê de bi aktîvîsta femînîst a Îtalyayî Gea Pîccardî re hevpeyvînek hate kirin ku Pîccardî ji perspektîfa eko-femînîst li ser Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê û Jineolojiyê doktora kir.

# RÊVEBERIYA XWESER VÎNA HEMÛ GELÊ SÛRIYÊ YE

Hevseroka Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed li ser armanca wan ji hevdîtinên diplomasî li gel welatên din û ya herî dawî li gel komara Misrê, ji rojnama me re wiha axivî: Armanca me ji van hevdîtinan ew e ku, em êrîşên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku pêk tên, ji hemû cîhanê re pênase bikin. Herwiha li ser çareserkirina aloziya Sûriyê jî, nêrîn û pêşnûme pêşketin. Me ji wan re da xuyakirin ku, pêwîste nûnerên gelê Bakur û Rojhlatê Sûriyê beşdarî konfirans û civînên ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê tên li darxistin, bibin.

**Dilîn EHMED**

**ARMANCA ME RAWESTANDINA ÊRÎŞÊN TIRKIYÊ YE**

Di derbarê gera xwe ya dîplomasî de Îlham Ehmed wiha axivî: "Armanca me ya serke ji van hevdîtinan ewe ku em êrîşên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tên rawestînin, û armancên Erdogan ya guhartina demografiya herêmê, bi nasînin. Ev êrîşên Tirkiyê ku li ser bajarê Girê Spî û Serê Kaniyê pêk hatin, bû sedema kuştin, koçberkirin, û talankirina mal û milkên gel û kesên ji deverên cuda tînin di cihê xelkê herêmê de bi cih dikin. Lewra divê metirsiyên ku guhartina demografî û qirkirinên nijadî ku li herêmê çê bibin bi welatên din re parvebikin.
Îlham Ehmed destnîşan kir ku Rêveberiya Xweser vîna gelê herêmê ye û wiha axaftina xwe berdewam kir: Di Hevdîtinên ku me li dewletên derve çêkirin de, me li ser kar û xebatên Rêveberiya Xweser ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimeîne agahî parvekirin. Ji ber ku rola dewletên navdewletî di mijara çaresrerkirineke siyasî de girîng e û kirîziya Sûriyê jî ji bilî çareserkirineke siysî nayê çêkirin, di hemû hevdîtinên me de me da xwuyakirin ku Rêveberiya Xweser vîna gelê herêmê ye û pêwîste piştgirî jê re bê kirin. Tevî ku ev rêveberî rastî êrîş û astengiyan ji aliyê dewleta Tirkiyê a dagîrker ve tê, lê heta niha ew bi awayekî sîstemkirî karê xwe dide meşandin. Çi pirojeyên ku nû têne avakirin helbet wê şaşitî derbas bibin, lê ya girîn ew e ku gelê herêmê ji bo pirojeya demokratîk li ber xwe bidin, û pîlanên dijiminan bi tekoşîna xwe têk bibin.

**JI BILÎ NÛNERÊN HERÊMÊ TI KES VÊ ALOZIYÊ ÇARESER NAKE**

Hevseroka Meclîsa Sûriyê ya Demokratîk Îlham Ehmed di dawiya axaftina xwe de wiha got: Sedema binkeftina hewldanên çaresrkirina kirîza Sûriyê ew e ku, nûnerê Bakur û Rojhilatê Sûriyê nayên beşdarkirin. Ji ber vê yekê divê ev siyaseta çewt were guhertin, û divê her kes bizanibe ku çareserkirina siyasî divê li pêş be. Ji xwe ya herî girîn divê nûnerên Sûrî di vê çareserkirinê de beşdar bibin. Hevdîtinên me wê berdewam bin, û divê tevahî cîhan bizanibe ku ti kes nikare îradeya me bişkîne.



## Tirkiye hewl dide dagirkeriyê berfireh bike

Dewleta Tirk a dagirker herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên wekî Efrîn, Cerablus, Ezaz, Bab, Girê Spî, Idiblib û Serêkaniyê dagirkirine.
Di 24'ê Tebaxa 2016`an de dest bi dagirkirina xaka Sûriyê kir, anku piştî 12 rojan ji binketina DAIŞ`ê li Minbicê.
Artêşa Tirk di dagirkirina xaka Sûriyê de komên çeteyan bi kar anî, armanca vê yekê jî koçberkirina sivalan bû û bichkirina malbtên çeteyan e, li gel vê yekê zimanê Tirkî bide ferzkirin, navên bajar, qadan û avahiyên giştî biguhere û bi vê yekê demografiya herêmê têk biçe.
Derbarê êrîşên artêşa Tirk ên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Yunis wiha anî ziman, dewleta Tirk hewldana guhartina demografiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike, lewma rasterast dest bi êrîşên li dijî herêmê kir.
Lê belê siyaste Tirkiyê eşker ye û mînaka dagirkirina Efrînê ber çav e.
Heverokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Demokratîk a herêma Cizîrê Talat Yunis binpêkirinên artêşa Tirk bi bîr xist û got: "Piştî artêşa Tirk bajarê Efrînê dagirkir, demografiya herêmê guhart, çewistandina nasnameya gelan kir armanc, lewma malbatên çeteyan li herêmê bi cih kir û zimanê tirkî da ferzkirin."
Yunis got: "Dewleta Tirk piştî êrişî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, heman siyaset da meşandin û li Girê Spî û Serêkaniyê gel koçber kirin û malbatên çeteyan bi cih kir. Niha jî nasnameya sivîlan diguhere.Tê zanîn ku li Girê Spî û Serêkaniyê gelên Kurd, Ereb û Ermen dijiyan.Bi kurtayî mirov dikare bibêje, armanca Tirkiyê berfirehkirina rûbera xaka Tirkiyê ye.



## Sê rêhevalên dilşêr

**Mihemed ŞAHÎN**



Siyasetmedarên dilşêr û rûken, jîr û bi coş, xewnbarên pêşerojê, rêwiyên azadiyê, …

"Bila neyê jibîrkirin!
Li reştariyê hatibû zincîrkirin
Welatê min,
Bila neyê jibîrkirin!
Ronahiya Rojê qedexe kiribûn li welatê min,
Bila neyê jibîrkirin!
Zîn li Mem, Mem li Zînê hatibû qedexekirin,
Ji bîr nekin Kurdîno!
Niha evîna me bi sê rengan hil tê, di bihara ruyê sê kulîlkên Silopiyayê de …

Duh 4'ê çileyê bû,
Duh çaremîn salvegera şahedeta siyasetmedarên dilşêr û rûken rêheval Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar e.

Di 4'ê çileya 2016'an de, di hêlîna destpêka hebûna mirovahî û hemû candaran de, di welatê Nuh Pêxember de, di bin quntarê çiyayê Cûdî yê pîroz ê ku keştiya Nuh li ser danîbû, di bin siya çiyayê Gebarê ku bi xwîna fermandarê nemir Egît hatibû efsûnkirin, di sêgoşeya dilê welatê min ê çarparçebûyî de, li navçeya Silopiyayê Hurmuz û Ehrîman di şerekî bê eman de bûn.

124 hezar pêxemberên ku li dijî reştariya Ehrîmanan bi ser neketibûn, li ber berxwedana zarokên rojê bejna xwe ditewandin. Silav didan zarokên rojê. Li hember berxwedana rêhevala Sêvê û hevalên wê yên dilpola bêzar bûbûn.

Di 4'ê çileya 2016'an de di navbera reştarî û ronahiyê de şereke bê eman dest pê kiribû. Ev şerê man û nemanê bû, ev şerê tarî û ronahiyê bû, ev şerê parastina nirx û rûmetên mirovahiyê bû. Ev şerê tola 5 hezar salan bû. Neviyên Ehrîman ên tarîparêzan dixwestin di hêlîna şûnwarê destpêka jiyanê de dawî li jiyana neviyên Hurmuz ên ronahîparêzan bînin. Dixwestin di şûnwarê destpêka jiyanê de careke din reştariya hişmendiya xwe li ser welatê min ferz bikin.

Lewre wateya şer cuda bû, berxwedan jî weke wateya wê bê hempa bû. Li hember tarîtiya Ehrîmanan berxwedana zarokên rojê weke kaya li ser melêva cotkarekî li 12 e şûnwarên Kurdistanê ax didêra. Ji wan 12 şûnwaran yek jî Silopiya bû.

Bêguman yê ku herî zêde eniya tarîparêz ditirsand ronahiya hişmendiya jina azad bû. Tirsa ronahiya hişmendiya Zarîfeyan, Beseyan, Leylayan, Berîtanan, Zîlanan wekî kabûs li ser wan rûniştbû. Lewre di hedefa şerê wan ê bê pîvan û bê exlaq de wekî her carê dîsa hişmendiya jina kurd a azad hebû.

Bi sedan sal in li welatê min Ehrîman erkdar in. Bi sedan sal in li welatê min azadî, aştî, ronahî û vîna azad qedexe ye. Bi sedan sal in hevrêyên Hurmuz bi berdêlên gelek giran li dijî Ehrîmanan li ber xwe didin.

Di 4'ê çileya 2016'an de têkoşerên vîna azad, parazvanên azadî aştiyê, sê kulîlkên Kurdistanê, Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar li kolanên Silopiya ya ji hêla hêzên dewletê ve bi awayekî hovane hatin qetilkirin. Di destê sê jinên kurd de çek tune bûn, bombe tune bûn, çebilxane tune bûn, tu amûreke şer tune bûn, tenê û tenê di dilê wan de ronahiya vîna azad hebû.

Di êvara 4'ê çileya 2016'an de stêrk, heyv, roj hemû li hember şahadeta sê kulîlkan şermî bûn. Min ji stêrkên şevê pirsî, ka sê kulîlkên Silopyayê? Ji min re gotin; "Bêhna kefa destên wan ketiye nav porê zarokên Silopyayê". Min ji heyva 14 şevî pirsî, ka parazvanên gelê xwe sê jinên dilşêr? Ji min re got; "Ez kenên wan ên dawî me". Min ji rojê pirsî ka zorokên te yên ku te şewqa xwe dabû dilê wan? Ji min re got; "Ez pêta agirê dilê wan im". Min ji asoya berbanga sibehê pirsî, ka rêhavalên Hurmuzê, ka evîndarên pêşeroja welatê xwe Sêvê, Pakîze, Fatma? Ji min re got; "Ez evîna dilê wan im"…

Evîna dilê sê jinên dilşêr, wêjeya Ehmedê Xanî, helbesta Feqiyê Teyran, evîna dilê Bêrîtan, Avesta Xabûr û Arîn Mîrkan a nîvçe mayî ye. Ka ji kerema xwe re ji min re bibêjin, gelo, kîjan wêje, kîjan helbest dikare evîna dilê wan rêhevalan vebêje.

Rêhavlên wan ên ku mizgîniya serkeftinê ji rûkeniya wan lêhengan girtine, li seranserê çarparçeyên Kurdistanê bi baweriya serkeftina dilê wan wekî pilingan li ber xwe didin.


Sê rêhevalên ku di rûkeniya xwe de mirin bê wate kirine bûne pêta agirê dilê zarokên welatê min, bûne kevirê dest, bûne dirûşm, bûne tilîlî, bûne soza serkeftinê, bûne soza girtina tola sedan salan, bûne hêrs û xezeba dojehê û li dijmin dibarin.

Bêguman, civaka kurd dê her tim navê wan lehengan û berxwedana dilê wan bi rêzdarî bibîr bîne. Dê navê wan lêhengan li zarokên xwe yên nûhatî bikin, bi evîna dilê wan zarokên xwe efsûnî bikin û heta roja serkeftinê roj bi roj ala berxwedana wan bilind bikin.



# Kuştina Suleymanî û destwerdana Tirkiyê li Lîbyayê...herêmê ber bi şer ve dibe

Li herêma Rojhilata Navîn nîşaneyên şerekî mezin diyar dibin, ew îhtîmal piştî kuştina Qasim Suleymanî û biryara Tirkiyê ya ji bo şandina hêzan ji Lîbyayê re xurttir dibe.





Rojnameyên cîhanê behsa kuştina fermandarê Feyleq El-Quds ê îranî Qasim Suleymanî û biryara parlamentoya Tirkiyê ji bo şandina leşkeran li Lîbyayê kir.

**NEW YORK TIMES: KUŞTINA FERMANDARÊ ÎRANÊ YÊ MEZIN LI IRAQÊ BI FERMANA SEROK TRUMP E**

Rojnameyên cîhanê îro behsa gelek mijaran kir, yek ji wan jî kuştina Qasim Suleymanî. Der barê wê de rojnameya New York Times a Amerîkayê diyar kir ku êrişa li ser balafirgeha Bexdayê, nakokiya mezin a di navbera Amerîka û Îranê de ye. DYA`yê piştrast kir ku wê êriş pêk anî ku Qasim Suleymanî fermandarekî Artêşa Pasdaran a Îranê kuşt. Kuştina wî çli dijî Îranê derbeyeke mezin e û di demekê de ku her du welat di pêvajoyên hesas û nakok re derbas dibin, pêk hat. Bi wê re jî metirsiyeke mezin çêdike.

**THE GUARDIAN: KUŞTINA QASIM SULEYMANÎ BI FERMANA TRUMP E**

Rojnameya The Guardian a Brîtanyayê wiha nivîsand: "Koşka Spî destnîşan kir ku kuştina Qasim Suleymanî, xebata parastineke tund e ku serok Trump rê ji bo kuştina fermandarê hêza Feyleq El-Quds di êrişa balafirgeha Bexdayê de da."
Her wiha Koşka Spî diyar kir ku Donald Trump fermana bombebarankirinê da ku di encamê de generalê Îranê Qasim Suleymanî li Bexdayê di seatên sibehê de hate kuştin. Bi wê yekê aloziyeke dirêj di navbera Washington û Tehranê de ji bo desthilata li hemû herêmê rû da.
Her wiha Îranê jî kuştina Suleymanî piştrast kir û got ku dê DYA berpirsa cezayan be.
Suleymanî operasyonên leşkerî yên Îranê li Iraqê û Sûriyê bi rê ve dibirin. Dema ku ji balafirgeha Bexdayê diçû, ew û cîgirê serokê yekitiya rêveberiya projeyê Ebo Mihdî El-Muhendis hatin kuştin.

**WALL STREET JOURNAL: TIRKIYÊ BINGEHA QANÛNÎ JI BO BELAVKIRINA HÊZÊN XWE LI LÎBYAYÊ DANÎN**

Der barê tevgera Tirkiyê li Lîbyayê de rojnameya Wall Street Journal wiha nivîsî: "Washington ji tevgera Tirkiyê ya li dewleta ku bi petrolê dewlemend e bi fikar e, dibe ku şerê demdirêj di navbera her du dewletan de kûrtir bike."
Parlamentoya Tirkiyê şandina hêzên Tirkiyê ji Lîbyayê erê kir, bi vê yekê dê tevlêbûna Enqereyê li herêma Deryayê Spî zêde bike.

## Dumaya Rûsya şandina hêzên Tirkiyê ji bo Lîbyayê red kir

Meclisa Duma ya Rûsyayê şandina hêzên Tirkiyê ji bo Lîbyayê red kir.
Cîgirê Serokê Komîteya Duma ya Karûbarên Derve Dmitry Novikov ragihand ku Tirkiyê bi şandina hêzên xwe ji Lîbyayê re wê rewşê aloztir bike û dê bi awayekî neyînî bandor li gelê Lîbyayê bike.
Dmitry Novikov ragihand ku Rûsya wê li gorî geşedanan tevî ku tevahiya hîman di ber çavan re derbas bike, siyasetên xwe ava bike.
Parlamantoya Tirkiyê şandina hêzên leşkerî ji Lîbyayê re erê kir. Ev gav li ser asta herêmî û navneteweyî rastî nerazîbûnan hat. Misrê bi tundî ev gav şermezar kir. Koşka Spî ragihand ku Serokê Amerîkayê Donald Trump piştî çend saetan ji erêkirina Parlamatoya Tirkî mûzekereya şandina hêzên Tirkiyê ji Lîbyayê re, Serokkomarê Tirkiyê Receb Tayyîp Erdogan agahdar kiriye ku mudexeleya biyanî di Lîbyayê de rewşê aloztir dike.



## Berxwedana Rumetê, serkeftina mezin nêzîk e!

**Dilyar CIZÎRÎ**



Şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe ve û di demeke ku li tevahî Sûriyê aloziya herî mezin dihate jiyankirin, karîbûn sîstema xwe ya demokratîk ava bikin û aştiyê li tevahî herêmê pêk bînin. Ev sîstema ku hêza gel nîşan dida, ne li gorî xweşiya desthildara û dagirkeran bû. Ji lewma êrîşên hovane pêk hatin. Ev êrîşên ku ji heman çavkaniyê pêk dihatin di bin navên cûda de dihatin meşandin. Ji komên di bin navê Artêşa Azad de bigire û heta El-Nusra, DAIŞ û herî dawî êrîşên dewleta Tirk li ser Serêkaniyê û Girê Spî bû. Di van êrîşan de jî gelê herêmê bi awayekî hevgirtî û yek destî li ber xwe dida û destkeftiyên mezin bi dest dixistin. Niha û di dema Şoreşa Sûriyê ketiye sala xwe ya dehan de tu kes nikare destkeftiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ne dîtî ve hesab bike.
Di vir de çima me pêwîstî pê dît ku em wan destkeftiyan bi bîr bixin, ji ber em berhsa destkeftiyên Berxwedana Rumetê ya Serêkaniyê û Girê Spî dikin. Dewleta Tirk bi alîkariya hezaran çeteyan û bi sîlahên NATO yê herî pêşketî ev êrîş pêk anî. Bê guman mirov nikare di aliyê leşkerî û teknîkî de hêzên ku şerê hev dikin bîne ber hev, lê tişta em dixwazin bi bîrbixin, tevî hemû derfetên kêm, beranberî dewleta Tirk berxwedanek dîrokî û bi rumet tê kirin. Raste Serêkaniyê, Girê Spî û herêma di navbera wan de ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hate dagirkirin, lê yê biser ket ne ew bûn, gelê kurd û tevahî pêkhateyên Bakur û Rohilatê Sûriyê ne. Dibe hinek kes bi vê gotina min bikenin û henekê xwe bikin, lê bila baş bizanin, wê rojek were, ewê ji wî kenê xwe şerim bikin, ew roj jî ne pir dûr e. Ezê hewl bidim di vê nivîsa xwe de ji wan re niha rave bikim çima!. Raste Serêkaniyê û Girê Spî di aliyê leşkerî de dagirkirin, lê di aliyê dîplomasî û siyasî de gelek derî ji Rêveberiya Xweser û MSD'ê re hatin vekirin. Hevdîtinên herî dawî ku fermî di navbera wezaretên hin welat û şandeyên siyasî yên herêmê de hatin kirin li ber çavan bû. Ya ji vê girîngtir jî doza Bakur û Rojhilatê Sûriyê ket rojeva hemû cîhanê û piraniya gelan piştgirî dan Rêveberiya Xweser û Berxwedana gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê.
Ev pişgiriya civakî û vebûna deriyên siyasî û dîplomasî ne tiştekî wiha bi hêsanî pêk tê, ev berhema Berxwedana Rumetê ye. Di demên pêş de jî wê encamên wê yên erênî derkevin holê. Dema hilbijartên welatên mezin ên cîhanê wê ev diyar bibe. Partî û siyasetmedarê li kîjan welatê cîhanê be jî ku pişgiriya gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike wê di hilbijartinan de piwanan bi dest bixe. Cîhan wê ji bîr neke ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê birayên Erdogan El-Nusra û DAIŞ ên li ser hemû cîhanê xetir in, têk birin. Bê guman qehremanên Berxweda Baxoz, Reqa, Dêrazor û her wekî din wê karibin rojekê Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî jî rizgar bikin.
Lê tişta niha ji welatiyên me yên ji Serêkaniyê û Girê Spî koçber bûne, tê xwestin, li ser esasê baweriya azadî nêzîk e, tekoşîna xwe dewam bikin. Beriya ez vê nivîsa xwe jî bi dawî bikim, dixwazim tiştekî bibîr bixim, bi rastî jî gelê me yê koçber ku em wan di kampan de dibînin, wê yekê pêk tînin. Di kampa Waşokanî de wekî mînak rêxistinkirina civakê bi meclîs û komînan mînaka wê ya zindî ye.

**FENER**



## Qeyûm Efendî Behsa Rastiyên Cografîk Û Dîrokî Dike?!

**Idrîs HENAN**

Di heman dema ku li Desteya Giştî ya Meclîsa Enqerê de tezkereya şandina leşkeran ji bo Lîbyayê erê dibû, li paytexta Yonanistanê Atînayê, serokwezîrê Îsraîlê Netanyaho, Serokkomarê Qibrisê Nîkos Anastasîades û Serokwezîrê Yonanistanê Mîçotakîs peymana EastMed îmze dikirin. Li Meclîsa Enqerê ji 509 dengên çep, rast, neteweperest û olperestan, 325 dengan tezkereya destwerdana Lîbyayê erê kirin. 184`an jî bê teref man!. Ev Tezkere bi serkêşiya AKP-MHP bi mebesta nixumandina qeyrana li Tirkiyê hate derbaskirin.
Perelelî herdu kêliyan, qeyûmê Qibrisa bakur Mustefa Aqincî îmzekirina peymana EastMed li Atînayê rexne dikir û weke der-rastiyek congrafîk ku li dûrî aqlê aborî ye, bi nav dikir. Qey dagikirina beşa bakur ji Qibrisê û tirkkirina wê rastiyek dîrokî ye qeyûm efendî?. Yan jî dagirkirina axa Sûriyê rastiyek cografîk e? Nizanim; qeyûm efendî; eceba îmzekirina tezkereyên destwerdanên derveyî sînor li meclîsa Enqerê, rastiyên li nêzî aqil in? Lê gelo; dagirkirina şaredariyên gel li Bakurê Kurdistanê kiryarên aqilane û rastiyên cografîk û dîrokî ne?.
Aqincî zemanekî difikirî serokçeteyê Rojhilata Navîn û faşîstê serdemê Erdogan rexne bike, rastî gef û rezaleta Erdogan hat. Ji wê rojê ve jî deng jê nayê. Îro jî ji bo ku şoşbanê xwe yê dîktator Erdogan razî bike dahûrandinan dike!. Projeya EastMed a vaguhestina gaza xwezayî ya behra spî ya di navbera Îsraîl, Qibris û Yonanistanê de weke dûrî heqîqetên global pênase dike. Qeyûm efendî di heman dahûrandinên xwe de, paşperdeya nirxandinên xwe jî deşîfre dike û dibêje: Rastiyên cografîk isbat dikin ku ti projeyên enerjiyê li deryayê spî bê Qibrisa bakur û Tirkiyê çênabin. Wek ku çawa hebûna xwe ya mêtinger û mandane rewa û meşrû dike!.
Beriya rojekê wezîrê parastinê yê Tirkiyaya Erdogan Xilûsî Akkar di derbarê hebûna leşkerên Tirk li Idliba Sûrî de digot; ew ê 12 xalên xwe li Idlibê vala nekin û ew ê ji axa Sûriyê venekişin.
Perelelî van daxuyaniyên wezîrê şer ê Erdogan, li bajarê Ra`î yê bakurê Sûriyê, li ser navê meclîs û togayên tirkmen, hikûmeta faşîst a AKP-MHP avahiyên Selcoqî ava dikirin. Çaw li Efrîn, Ezaz, Bab û Cerablusê, li Serê Kaniyê û Girê Spî postxane, avahî û saziyên AKP-MHP dihatin avakirin. Li kêleka wê jî çeteyên kurtêlxwar ên ku şandine Lîbyayê, li ser axa Afrîqyayê Trîploî, him dîl digirtin û him dikuştin.
Dewleta faşîst a Tirkiyê destwerdan û tadeyên xwe yên li ser gelan û jêderên xwezayî yê herêmê weke mafekî xwezayî dibîne. Bi hemû aliyên hegemon re, li ser bingehên misyoneriyê li hev dike û îmzeya xwe li ser hesabê civaka Tirkiyê davêje bin hemû lihevkirinên xiniziyê. Erdogan ku pêveka sermayeya golbal e, hewl dide xwe weke aktorekî sereke li ser lîstikvanên navdewletî ferz bike. Bi riya wê siyaseta parçebûyî, dihizire wê li ser dika desthilatdariya herêmê, împaratoriya xwe ya çors ava bike!. Ji lew re, li her cihê destwerdan kiriye, xirabî kiriye. Dagirkirina axa Sûriyê û Qibrisê, îmzekirina tezkereya destwerdana axa Lîbya jî mînakên beloq ên faşîzma hikûmeta Erdogan a dîktator e. Lê duh ne wek îro ye, tekez sibe jî wê neşibe îro. Ger heya îro bi riya kerên ku xwe li mayînan dixin, şer û pevçûnên xwe bi rê ve dibe, ji îro û pê ve ew ewantaj ji dest daye. Êdî ne rastiyên cografîk, ne rastiyên siyasî û dîrokî, ne aqlê civakî û aborî û ne jî heqîqeta gelan wê rê bidin van erbedeyên faşîst Erdogan. Rastiya dîrokî û cografîk ew e ku; êdî têkoşîna gelan a azadiyê, tenê ji bo pêşeroja xwe ye. Gerese hinek kurtêxwarên gelan hebin, lê ew nayê wê wateyê ku; wê qeyûmên fena Aqincî û hemriyên wî heya dawiyê bisûd bin.